Li ser aşîya Înflûenza (“grîp”)ê

Nexweşînên bêhnstandinê yên akut, di nava nexweşînên mirovan ên herî lêrasthatî de ne. Patogenên cûrbicûr, nemaze vîrus dibin sebebê van nexweşînan. Vîrusa înflûenzayê sebeba ‘berra’ yê grîpê ye, roleka xwe ya navendî heye. Rola taybet a înflûenzayê ji ber bi awayê epîdemîk her sal dîtina wê ye. Tevlî van, vîrusên înfluenzayê bi pirranî dibin seyreka girantir ji sebebên nexweşker ên din ên dibin sebebên nexweşînên bêhnstandinê yên akût. Parastina herî baş, aşîbûna di zemanê xwe de ye. Aşîya înflûenzayê, bi cûrê xwe nabe sebebê parastina li dijî nexweşînên bêhnstandinê yên akût ên sebebên nexweşker ên din ên seyreka xwe ya sivik heye.

Înflûenza, nexweşîneka bêhnstandinê ya akût a tevlî kelekela laşî, kuxînê û êşa masûlkeyan e; dibe ku mirov her car nikaribe di klînîkê de wê ji nexweşînên bêhnstandinê yên din cuda bike. Nexasim bi nexweşên pîr û kronîk re bi awayekî ciddî dîtina înfluenzayê tiştekî pirrdîtî ye. Grîpa bi vîrus di demsala sar de bêtir tê dîtin. Ji ber vî awayî, aşî, divê bi pirranî di mehên payîzê de were standin. Lêbelê aşîya parêzer her dem kare were standin. Vîrusên înflûenzayê her car diguherin û ji ber vî sebebî kesên ku sala berê bi nexweşîna înflûenzayê ketine an jî kesên aşîbûyî jî dibe saleka din dîsa bi nexweşîna înflûenzayê bikevin. Ji ber vî awayî aşîya înflûenzayê divê her sal bi aşîyeka heyî were nûkirin.

Aşî

Aşîya înflûenzayê her sal li gora şîreta heyî ya Dezgeha Tenduristîya Dinyayê (WHO) tê berhem anîn; ji vê re tê gotin **aşîyeka demkî**. Ev şîret li gora danberçava belavbûna vîrusên înflûenzayê yên cûra A û B-yê yên wê salê yên cîhanê tên kirin. Di aşîyê de bi pirranî terkîba du vîrusên înfluenza A-yê (A/H1N1 ve A/H3N2) û yeka înflûenza B-yê heye. Bi navberên mezintir, li cîhanê xetera belavbûna patogeneka nû ya înflûenzayê heye (pandemîk). Piştî sala 2009ê rewşa “înflûenzaya nû A/H1N1”ê ya carna wek “grîba berazan” dihat binavkirin jî weha bû. Lêbelê, ev sebebê nexweşker ê di vê navberê de şûna vîrusên A/H1N1-ê yê înflûenzaya ku berê digerîya de cîh girtîye, herweha wek yek ji madeyên terkîba aşîya înflûenzayê ya demkî ya heyî tevlî wê hatiye kirin. Xasma ji ber karîna kintirbûna parastina diberxwedana kesên pîr û yên ku berê teşqeleyên wan ên tenduristîyê hebûne, di rewşên îstîsnaî de, eger terkîba aşîyê di sezonekê de neyê guhartin jî divê aşîyeka nû li wan were xistin.

Di aşîyên bêbandorkirî (aşîyên mirî) de terkîbên vîrusên înflûenzayê yên li dijî nexweşînê diparêzin hene. Ev, an li ser binyata hêkên mirîşkan-tûtikan an jî di yek demê de di kulturên hucreyan de tên berhem anîn (ev aşî ji bo mezinên 18 salî û berjortir hatiye pejirandin).

Ev aşî bi pirranî wek derzîlêdana nava masûlkeyê tên pêkanîn, wek nimûne; tên valakirin nava masûlkeya jora milî. Aşîyek (ji bo kesên 60 salî û berjortir) ji bilî van li çermî jî tê dayîn (valakirina li binê çermî). Aşîya înflûenzayê tevlî aşîyên din tê lêxistin. Zarokên di nava mehên 6 û 35ê de bi doza 0.25 mL-yê, zarokên ji 36 mehan mezintir, gihîştî û mezin bi doza 0.5 mL-yê tên aşîkirin. Zarokên berê aşînebûyî, bi kêmayî bi navbera 4 hefteyan 2 aşî li wan tên xistin. Parastina aşîyê, piştî aşîkirinê hema hema ji 2 heta 3 hefteyan pê de dest pê dike.

Kî divên aşî bibin?

Salixê aşîya înflûenzayîxê xasma ji bo hemû kesên bê parastin tê dayîn:

- Kesên 60 salî û berjortir
- Ji dewra sê mehan a didoyê pê de hemû jinên ducanî (di bûyerên tenduristîyê yên pirr xeternak ên ji ber sebebekî piştperde de, ji dewra sêmehên pêşîn pê de)
- Kesên bi sebebê karê xwe her roj bi gelek kesan re têkilî dikin, wek nimûne; şofêrên otobêzan an jî mamoste
- Şênîyên malên pîran an jî xanên pîran
- Wek nimûne, wek nexweşînên bêhnstandinê yên daîmî, nexweşînên kardîyovaskular ên daîmî, nexweşînên cegerê û gurçikê, nexweşînên metabolîk (wek nimûne ya şekirî-diyabet) an jî xerabûnên irsî yan yên diberxwedanê yên paşê peydabûyî (wek nimûne enfeksîyona HIV-ê), nexweşînên nurologîk ên kronîk (wek nimûne skleroza pirrcarî) yên bi sebebên xwe yên piştperde yên nexweşînê mezin, gihîştî û zarokên xwedanên rîska astbilind a tenduristîyê
- Wek nimûne karkerên tenduristîyê û pîr û karkerên nexweşan xwedî dikin jî di nav de, kesên li xwedîkirîyan xetera xwe ya belavkirina nexweşînê hebin û di heman demê de xetera standina nexweşînê ji xwedîkirîyan jî hebin
- Kesên bi heywanên koxan û balindeyên kûvî re yekser têkilî dikin

Ji bo aşîkirina jinên ducanî şîreteka nû hatiye kirin; ji ber ku lêkolînên kirî nîşan dane ku di dema nexweşîna înflûenzayê de jinên ducanî ji bo bipêşvebirina komplîkasyonê bi awayekê di binê xeterê de ne. Bandorên kêlekî yên nexwastî ne di zarok de û ne jî di dê de nehatine dîtin.

Kesên ji ber nexweşînên kronîk ên nurologîk nexweş, wek nimûne ji ber nexweşînên nuromaskular azarkêş jî di koma xeterbilind a hêdî bipêşketî ya înflûenzayê de ne (zarok jî). Ji ber vî awayî, ev nexweş û nexweşên MS-yê yên ku înflûenza kare bibe sebebê ducarîbûna nexweşînên nû jî divên aşî bibin.

Kî divên aşî nebin?

Zarokên bi nexweşîneka akût a bi kelekel ketine divên aşî nebin. Aşî, heta mumkin be divê rojek berî rojekê were bûyîn.

Ev aşî, divê li kesên ji terkîba wê re hessasîyeta wan a pirr hebe neyê xistin. Ev dibe ku bûyereka wek hesasîyeta ciddî ya li dijî proteyîna mirîşkê be. Ev nexweş divên bi dixtorên xwe bişêwirin ka aşîyeka alternatîf a di hêka mirîşkê de nayê berhem anîn heya an na.

Xwedîtîya piştî aşîyê

Pêdivîya kesê aşîkirî bi xwedîkirina taybet tune ye, lêbelê di proseya 3 rojên piştî aşîyê de divê ji stresa fizîkî ya neasa xwe dûr bike. Kesên meyla wan a raperka kardîyovaskular hebin an jî raperka wan a hesasîyetê ya yekser hebe, berêya ku aşî bibin divên bi dixtorê xwe bidin zanîn.

Piştî aşîyê raperkên muhtemel ên herêmî û sîstemîk

Piştî bûyîna aşîyê, tevlî diberxwedana xwastî û herweha li dijî nexweşînê, car caran dibe devera aşîkirî sor bibe û werma biêş peyda bibe. Ev, nîşaneya raperka asa ya laşî ya li dijî aşîyê ye û gelekê caran di nava 1 heta 3 rojan de tê dîtin, kêm caran dirêjtir jî dewam dike. Car caran li deverên nêzîk bezên lenfê diwerimin û hişk dibin. Nîşaneyên tevahî yên wek kelekela laşî, hisîna bi sermayê, lihevketina dilî, şikestîbûn, emel, westîyayîbûn, xweyêdan, êşa serî û êşa masûlke û movîkan jî karin werin dîtin.

Îhtîmal heye ku sebebê tevahîyê raperkên dewra aşîkirina nexweşînên wek înflûenzayê, bi şaşî lêxistina aşîya înflûenzayê be. Bi tevahî, raperkên navbuhurî yên mueqet, bersivên mueqet û sîstemîk in, û yên ku bêyî encam baş dibin.

Gelo hebûna zehmetîyên ji ber aşîyê mumkin e?

Bêtirî raperkên asa yên aşîbûnê, zehmetîyên ji ber aşîbûnê yên bandoreka ciddî li ser tenduristîya kesê aşîbûyî bibin kêm caran tên dîtin. Piştî aşîyeka înflûenzayê, kêm çaran raperkên çermî (car caran tevlî xurê û urtîkerê) û yên hesasîyeta sîstema bêhnstandinê hatiye dîtin. Kêm caran dibe ku îltîhaba reha xwîynê jî were dîtin (tevlî aşîya bi binyata kultura hucreyê, mûhtemelen tevlî tevlîbûna mueqet a gurçikan jî) û di encama wê de bi awayê çêkirina xwîynîbûnê dibe ku hejmara trombosîtan jî bi awayekê mûeqet kêm bibe. Raperkên hesasîyetê yên ji nişka ve (şoka alergîk) bi tenê di kêm bûyeran de hatiye raporkirin.

Bandorên kêlekî yên li ser aşîyên ên mûeqet ên nurologîk (sîstema sinêrê) yên wek felcê di bûyerîn kêmdîtî de bi awayê têkildarîya xwe ya mûeqet a pê re hatine raporkirin, lêbelê têkilîyeka bibe sebebê wê nehatiye dîtin.

Şîreta li ser bandorên kêlekî yên mûhtemel ên ji alîyê aşîkir ve tê dayîn

Tevlî vê reçeteya zanyarîyê dixtorê we jî şîretkarîya kesî ji li we dike.

Eger ku piştî aşîyekê bêtirî zehmetîyên li jorê binavkirî yên tevahî û herêmî yên zû derbas dibin peyda bibin, dixtorê we yê aşîyê helbet dê şîretan li we bike.

Hûn karin ji vê derê xwe bigihînin dixtorê aşîyê:

Qebûlnekirina Berpirsîyarîyê

Reçeteya binyatî ya zanyarîyê bi destûra (versîyon 06/2015) Deutsches Grünes Kreuz e.V [Elman Green Cross e.V]'nin li ser navê Dezgeha-Robert-Koch-î hatiye wergerandin. Metna Elmanî, ya bikêrhatî ye. Ji ber tu şaşîyeka wergerandinê an jî guhertinên paşê yên di metna binyatî ya Elmanî de berpirsîyarî nayê pejirandin.

Nav_____
Name

Aşîbûna li dijî înflûenzayê
Schutzimpfung gegen Influenza

Ji kerema xwe reçeteya zanyarîyê ya di pêvekê de hatiye pêşkêşkirin a ku awayê kirina aşîya înflûenzayê vedibêje bixwînin. Di nava vê reçeteyê de zanyarîyên li ser nexweşînên bi aşîyê astengî li ber wan kare were danîn, aşîya bikarhatî û zehmetîyên mûhtemel ên li ser aşîyê hene.
Anliegend erhalten Sie ein Merkblatt über die Durchführung der Schutzimpfung gegen Influenza. Darin sind die wesentlichen Angaben über die durch die Impfung vermeidbare Krankheit, den Impfstoff, die Impfung sowie über Impfreaktionen und mögliche Impfkomplikationen enthalten.

Berêya aşîbûnê zanyarîyên pêvekî yên jêrê tên xwastin:
Vor der Durchführung der Impfung wird zusätzlich um folgende Angaben gebeten:

1. Kesê ku aşî bibe niha baş û saxlem e?
   Ist der Impfling gegenwärtig gesund?

   □ Erê *(Ja)* □ Na *(Nein)*

2. Tu hesasîyeta-alergîya nexweşî ya ku tê zanîn heye? –bi taybetî li hember proteyîna mirîşkê?
   Ist bei dem Patienten eine Allergie – insbesondere gegen Hühnereiweiß – bekannt?

   □ Erê *(Ja)* □ Na *(Nein)*

   Eger ku hebe, kîjan?_____
   wenn ja, welche

3. Aşı olacak kişi, daha önceki bir aşı sonrası ateş ya da diğer anormal reaksiyonlar gibi herhangi bir alerjik tepki gösterdi mi?
   Traten bei dem Impfling nach einer früheren Impfung allergische Erscheinungen, hohes Fieber oder andere ungewöhnliche Reaktionen auf?

   □ Erê *(Ja)* □ Na *(Nein)*

Eger hûn bixwazin li ser aşîbûna parêzer a li dijî înflûenzayê zanyarîya bêtir bi dest bixin ji kerema xwe serî li dixtorê xwe yê aşîyê bidin.
Falls Sie noch mehr über die Schutzimpfung gegen Influenza wissen wollen, fragen Sie den Impfarzt!

Ji kerema xwe qeyda xwe ya aşîyê bînin hevdîtina aşîyê.
Zum Impftermin bringen Sie bitte das Impfbuch mit!

Forma qebûlkirinê
Einverständniserklärung

Ji bo birêvebirina aşîbûna li dijî înflûenzayê
zur Durchführung der Schutzimpfung gegen Influenza

Navê kesê ku aşî bibe: _____
Name des Impflings

Tarîxabûyînê/xwedêdan: _____
geb. am

Min reçeteya zanyarîyê xwand û di dema hevdîtina bi dixtorê xwe re zanyarîya bi kitkite stand.
Ich habe den Inhalt des Merkblatts zur Kenntnis genommen und bin von meinem Arzt/meiner Ärztin im Gespräch ausführlich über die Impfung aufgeklärt worden.

□ Tu pirsên min ên din tune ne.
Ich habe keine weiteren Fragen.

□ Ez ji bo aşîya li dijî înflûenzayê salixê wê hatiye dayîn pejirandina xwe pêşkêş dikem.
Ich willige in die vorgeschlagene Impfung gegen Influenza ein.

□ Ez aşîbûyînê naxwazim. Ez li ser zirarên mûhtemel ên qebûlnekirina vê aşîbûyînê hatim haydarkirin.
Ich lehne die Impfung ab. Über mögliche Nachteile der Ablehnung dieser Impfung wurde ich informiert.

Têbînî: *Vermerke* _____

Cîh û tarîx: *Ort, Datum*_____

_____ _____
Îmzeya kesê ku aşî bibe an wasîyê wî yê qanûnî
Unterschrift des Impflings bzw. des Sorgeberechtigten

Îmzeya dixtorî
Unterschrift des Arztes/der Ärztin